



KURMANJI

Bernameya teknîka endustriyê

**Bernameya teknîka endustriyê
bernameyeka pişeyî ye û
bidestxistina dîplomeya
pişeyî armanca wê ye.**

Bernameya teknîka endustriyê ji te re yê ku hez dike di warê berhemsazî, ewlehiya xebitandinê, sexbêrî û lehîmkariya di endustriya teknîkî de kar bike. Tu dê xwe fêrî plankirin, nexşkirin, çêkirin û xebitandinê bikî. Tu dê xwe fêrî bikaranîna sîstemên teknîkî yên pêşketî bikî.

Tu dikarî piştî qedandina xwendinê yekser kar bikî yan xwendina xwe li xwendîngeha bilind ya pişeyî berdeyam bikî. Tu dikarî jî ji xwe re kursên zêde bixwînî da xwendina xwe li xwendîngeha bilind bidomînî.

ÇAR PISPORIYÊN CUDA

Ewlehiya xebitandinê û sexbêrî

- Tu dê zanyariyan li ser sexbêriya stratejîk û binîzama werbigirî. Ev pisporî îmkane dide ku tu wek, bo nimûne, mekanîstê xebitîna otomatîk, mekanîstê xizmetê yan mekanîstê sexbêriyê kar bikî.

Teknîka prosesan

- Tu dê xwe fêrî prosesên endustrî yên kîmyayî û mekanîk, kontrola kalîteyê, teknîka birêvebirin û nîzambûnê bikî. Ev pisporî îmkane dide ku tu wek, bo nimûne, boyaxkerê endustrî, teknîkerê laboratûwarê di warê endustriya kîmyayî de yan kargêrê prosesan kar bikî.

Teknîka berhem û makîneyan

- Tu dê xwe fêrî bikaranîna amûret, alavên endustriyê û materyalan/malzemeyan bibî. Ev pisporî îmkane dide ku tu wek, bo nimûne, kargêrê CNC-yê (kontrola bi rêya komputerê) maden û dar, qalibker, makînegêr, xeratê/necarê makînegêr, nexşsazê grafîkî, çapker, teknîkerê berhemdanê, kargêrê kerestexanyê yan xeratê/necarê kargehê kar bikî.

Teknîka lehîmkirinê

- Tu dê xwe fêrî bikaranîna teknîkên lehîmkirinê bikî û xwe fêrî mîamelekirina lewheyên madenî bikî. Ev pisporî îmkane dide ku tu wek, bo nimûne, lehîmker kar bikî.

Tiştên ku tu dê di vê bernamê de fêr bibî

Tu dê xwe fêrî bikaranîna teknîka endustrî û berhemsaziyê bibî. Tu dê alav, materyal, malzeme û prosesan bi kar binî. Tu dê zanyariyan li ser qonaxên berhemsaziyê yên cuda, rêxistina karî, aboriya berhemana, bikaranîna madeyên xam û enerjîyê, kalîteparêzî û ka çawa hîlbijartina materyal, metod û teknîkan tesîrê li civak û jîngehê dike werbigirî.

Bona mirov xwe ji ziyarên karî biparêze û tenduristiyeka baş pêk bîne, giringiyeka mezin di vê bernamê de li ser pirsên jîngeha karî ye.

Bername weha hatiye rêxistin

Madeyên dersê di bernameyên pişeyî de madeyên lîseyê yê hevbeş in: îngilîzî, dîrok, werziş û tenduristî, matematîk, zanist, zanyariyên dînî, zanyariyên civakê û zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê.

Di bernameyên pişeyî de, tu dê zêdetir madeyên pişeyî, yê ku jê re madeyên taybetmend tê gotin, û kêmtir madeyên ku te li dibistana bingehî xwendine bixwînî.

Prosesên teknîka endustriyê, mirov di endustriyê de, zanîna berhemsaziyê û alavên berhemsaziyê madeyên taybetmend yê hevbeş yê vê bernameyê ne.

Îmkan heye ku tu di bernameyê de xwe pisportir û zanatir bikî. Ji wê re bernameyêkûrkolîn (programfördjupning). Ji xwendîngê bipirse ka ew kîjan kursên kûrlêkolînê dide.

Hilbijartina ferdî jî heye ku tu dikarî wê ya ku tu dixwazî bixwînî hilbijêrî. Ji xwendîngê bipirse ka kîjan kurs hene.

Awayên xebatê

Bername li ser pirsên ku tu dê bi serê xwe yan bi yê din re çare bikî ava dibe. Tu dê şiyana xwe ya însiyatîfîgirtinê û behremendbûnê xurt bikî, û zanyariyan li ser ka mirov çawa di nav şîrketên cuda de hevkarîyê dike û îmkanên birêvebirina şîrketeka şexsî werbigirî. Tu dê hîn bibî ku plankirin, pêkanîn, dokumentkirin û pêxistin ya karî bikî. Tu dê fêrî bijartina techîzat û metodên rast bibî.

Projeya lîseyê

Tu dê di dawiya Bernameya teknîka endustriyê de projeyeka lîseyê di warê pişeyî yê ku te bijartiyê de amade bikî. Tu dê bi wê nîşan bidî ku zanyariyên pêdvî yê ji bo destpêkirina karê ku te ji bo xatirê wî xwendiyê li bal te hene.

Fêrbûna li cihê karî

Hin beşên xwendinê herî kêr 15 hefteyan li cihê yan çend cihên karî bi rê ve diçin û jê re arbetsplatsförlagd lärande (apl) – fêrbûna li cihê karî – tê gotin. Ev parçeyeka giring ya perwerdeyê ye. Apl tecribeyan û herweha kontaktan yê ku dikarin di dema lêgerîna karî de ji te re bisûd bin dide te.

Şagirdîkirin

Heger xwendîngê di çarçoveya bernameyê de perwerdeya şagirdîkirinê ya lîseyî pêşkêş bike, tu dikarî wê hilbijêrî. Maneya wê ew e ku tu dê heman zanyariyan werbigirî lê dê herî kêr nîva xwendina xwe li cihê yan çend cihên karî bikî.

Balkişandin

Giring e ku tu xwendina xwe plan bikî heger tu bixwazî şertên bingehî xwendina bilind bi dest bixî. Hingê, pêdvî ye tu du kursên zêdetir yê zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê û kurseka zimanê îngilîzî bixwînî. Wê çaxê hergav mafê te heye ku tu bijartina şexsî bi kar bînî û wê îmkanê di bernameyeka zêdekirî de jî bi kar bînî. Heger tu bixwazî hêjî bixwînî, li gel rêberekê xwendin û pişeyê biaxive.

Hergav mafê te heye ku tu di çarçoveya hilbijartina ferdî de kurseka din ya zêde di warê werziş û tenduristiyê de û kurseka hunerê hilbijêrî.